## Beşdarî

Di yekemîn sala perwerdehiyê da, tevahiya zarokan beşdarî polên JeKits'ê dibin. Fêrkarî li polê û ligorî demajoya saetî tê lidarxistin, neçarî û bêpere ye.

Salên duyem, sêyem û çarem ên JeKits'ê dilxwazî û bi pere ye û hewcetî bi navnivîsandinê heye. Di babetên istîsna da, cihanîna JeKits 2 di şert û mercên taybet da li polê pêkan e.

Pişk û para mehane ya dêbavan herî pirr 13,50 € di mehê da ji bo her zarokekî ye. Renge ji bo pêşniyazên zêdetir mesrefên zêdetir bên wergirtin.

Ji kerema xwe ji dibistanê an şirîkê derveyî dibistana xwe bipirse ku çiqas alîkariya mehane ya dêbavan bi awayê xwecihî tê wergirtin.

**Miafbûn û daşikandin**
JeKits dixwaze ku heta radeya pêkan xwe bigihîne hejamreke zêdetir a zarokan li NRW'yê û bi aşkiratî tevahiya zarokên dibistana JeKits'ê bêyî berçavgirtina jêderk an atmosfera wan a civakî kirine armanca çalakiya xwe.

Di esas da şert û mercên aborî li malbatê nabe ku hegerek ji bo beşarînekirina li JeKits'ê bin.

Ji ber vê yekê hin miafbûn û daşikandin jî hene. Zarokên malbatên ku yarmetiya hemwelatiyê, refahê an jî alîkariyên civakî yên mîna wan distînin, ji xercên beşdariyê bêpar in.

Her wiha ji bo zarokên ku dêbavên wan alîkariya mesrefa malê, alîkariya mesrefa zarokan, alîkariya fêrkariyê an xizmetên din li gorî Qanûna raberkirina xizmetan bo daxwazkerên Penabertiyê werdigirin, beşdarî belaş û bêpere ye.

Eger du an çend zarok ji malbatekê beşdarî bernameyê bibin, pişk û para raberkirî ya tam tenê ji bo zarokê yekem tê hesabkirin û ji bo zarokên din tenê nîvê pere divê were dayîn.

## Têkilî

Hemû zanyariyên temamkirî derbarê JeKits'ê dikarî ji berpirsên bersivdêr li dibistana Mûzîkê, dibistana seretayî an dibistana taybet (Förderschule) a xwe werbigirî.

Her wiha tu dikarî agahiyên giştî li ser bernameyê ji Ofîsa Lijneya parêzgehî ya dibistanên Mûzîkê li NRW'yê (Lijneya tomarbûyî) li vê adresê werbigirî: www.jekits.de.

Ev bername ji aliyê parêzgeha Nordrhein-Westfalen'ê va bi beşdariya beşên NRW'yê û malbatên beşdar ji hêla aboriyê va tê dabînkirin.

**Lijneya parêzgehî ya dibistanên mûzîkê li Nordrhein-Westfalen'ê** (Lijneya Tomarbûyî)
Börnestraße 10
40211 Düsseldorf

info@jekits.de
www.jekits.de

Landesverband der Musikschulen in NRW

Ministerium für Kultur und Wissenschaft des Landes Nordrhein-Westfalen

JeKits
instrumente
tanzen
singen



# JeKits

**Saz, reqs, awaz ji bo her zarokî**

## Zanyarî ji bo dêbavan derbarê strîn û awazê

## Dayîk/bavê hêja,

Tu bi xêr hatî JeKits'ê Zarokê te li dibistanekê ye ku tê da „JeKits – Saz, reqs, awaz ji bo her zarokekî" tê raberkirin.

**JeKits çi ye?**
JeKits bernameyeke fêrkariya çandî li dibistanên seretayî û taybet li parêzgeha NRW'yê ye. Sê babetên wê yên sereke hene: Saz, reqs an Awaz. Zarokan ev derfet heye ku di heyama dibistana xwe da beşdarî vê bernameyê bibin.

**Armancên JeKits'ê çi ne?**
Ji heman destpêkê va, hûrbûna li ser jenînan saz, reqisîn û strîn (xwendina awazan) bi hev ra ye. Zarok pisportiyên mûzîk û reqsê werdigirin û wan xurt dikin. Ew bi vê rêyê derfetên derbirrîn û feraseta xwe ya hunerî keşf dikin.
Pêşketina wan bi hînbûna civakî, afirînerî û danûstandina çalak di gel mûzîk û reqsê li nav komê tê piştgirîkirin. Tecrubeyên cûr bi cûr û naveroka fêrkariyê ya avaker, bingehek ji bo jenînan saz, reqs û strîn anku xwendina awazan e.
JeKits dixwaze ku heta radeya herî pêkan xwe bigihîne hejmareke zêdetir a zarokên NRW'yêû fêrkariya mûzîk û reqsê bêyî berçavgirtina jêderk an atmosfera wan a civakî raberî wan bike.
JeKits ji hevkariya navbera dibistan û şirîkên derveyî dibistanê piştgirî dike. Bi vî awayî JeKits pêşniyazên çandî dewlemend dike û wan xurt dike.

**Çi xalên lêhûrbûnê hene?**
Her yek ji fêrgehên JeKits'ê yek ji warên sereke yên lêhûrbûnê – saz, Reqs an jî Strînê raber dike. Dibistana te lêhûrbûna li ser strîn û awazê bijartiye.

**Şirîkên hevkariyê kî ne?**
Dibistana te JeKits'ê di gel şirîkekî derveyî dibistanê bi cih tîne. Di lêhûrbûna li ser awaz û strînê da ev wek mînak dibistana mûzîka xwecihî ye. Fêrkarên wan bi giştî ji bo fêrkirina JeKits'ê tên dibistanê. JeKits ji bilî waneyên dibistanê tê lidarxistin û dewsa wan nagire.



## Yekemîn sala JeKits'ê (JeKits 1)

**Di yekemîn sala JeKits'ê da çi diqewime?**
Yekemîn sala JeKits'ê stratejiyeke cihêreng ji bo çêkirina mûzîk û afirandinê bi dengê raberî tevahiya zarokên polekê dike. Ji bilî vê yekê, bingehên din ên mûzîkê jî hene, wek mînak bi jenînan sazên sade û xwerû, hereket/reqs, guhdariya li mûzîkê.

**Di yekemîn sala JeKits'ê da fêrkarî bi çi awayî tê lidarxistin?**
Fêrkirina JeKits'ê her hefteyekê carekê li nav polê pêk tê û beşekea dersên dibistanê ye. Fêrkirin bi şêwaza xwedîbergiravî „Hevdudanî" pêk tê: Mamosteyê dibistana muzîkê (an jî saziyek wekhev) bi mamosteyê dibistana seretayî an jî bi mamosteyê dibistana taybet re dersê organîze dike.

Beşdarî neçarî û belaş e.

Di dawiya sala yekem a JeKits'ê da, zarok dikarin derbarê beşdariya di sala duyem a JeKits'ê da biryar bidin.

## Sala duyem heta çarem a JeKits'l (JeKits 2-4)

**Ji sala duyem a JeKits'ê va çi diqewime?**
Piştî çêbûna bingehên strîna komkî di yekemîn sala JeKits'ê da, zarokê te aniha di komeke stranê yên JeKits'ê da distire û gelek stranan ji çandên cûr bi cûr nas dike.

Pisportiyên awaz û strînê bi rêya fêrkirina dengî ya li ser esasa dengdanîna saxlem berfireh û xurt dibin. Zarok dikarin heta radeya pêkan bi awayê takekesî ji hêla hunerî û mûzîkê va bi pêş bikevin.

Di strîn û awazxwendina komkî da, ew xwe wek beşeke civakekê dibînin û vê tecrubeya erênî bi dest tînin ku pişkeke wan di serkeftina straneke da hebe. Her zarokekî ev derfet û şans heye ku sipasdarî, xwe-kêrhatîbûn û şiyana xwe biceribîne.

Dema ku zarok di komekê da distirên, şiyana têgihîştin û cîhana tecruneyên xwe berfireh dikin. Ev dikare moral û vînek ji bo danûstandina çalak a hetahetayî di gel mûzîk û çandê be.

Konsertên berdewam vê derfetê dide zarokan ku şiyana xwe li pêşberî temaşevanan nîşan bidin û di encamê da xwebawerî û pisportiyên xwe xurt bikin.

**Ji sala duyem a JeKits'ê va fêrkarî bi çi awayekî pêk tê?**
Fêrkirin ji sala duyem a JeKits'ê va li Koma strînê ya JeKits'ê tê lidarxistin.

Bi vî awayî şêwazên cûr bi cûr dikarin ji bo naverokên cûr bi cûr bên terxankirin. Dibistan û şirîkê fêrkariyê li gorî rewşa xwecihî biryar didin ku kîjan şêwazê bibijêrin.

Di babetên istîsna da, cihanîna JeKits 2 di şert û mercên taybet da li polê pêkan e.